



Agahiyên ji bo muşteriyên derbarê axaftinên bi navbeynkarên ziman re

Navbeynkarekî/e ziman dê di hevpeyvîna ligel pisporekî/ê de li ba we be. Pispore ew kes e ku hevpeyvînê bi rê ve dibe. Navbeynkarê/a ziman her tiştê ku tê gotin şîrove dike. Ev tê vê wateyê ku ew her tiştê ku hûn dibêjin werdigerîne almanî. Û her tiştê ku pispore dibêje werdigerîne zimanê we.

Li vir hûn ê agahiyên ji bo hevpeyvînê giring bi dest bixin:

Navbeynkarê/a ziman

- nepen e ango ti agahiya li ser we û derbarê naveroka hevpeyvînê de nagihîne kesên din.
- ji her kesê/a di hevpeyvînê de berpirsiyar e: ji we û ji pispore.
- bêalî ye ango pêşniyazan li kesî nake û piştgiriyê nade kesî.
- her tiştê ku ji hêla we û pispore ve tê gotin şîrove dike.

Hevpeyvîn

- Hêdî û bi zelalî bipeyivin.
- hevokên kurt û fambar saz bikin.
- Piştî du hevokan navberê bidin axaftinê da ku navbeynkar gotinên we wergerîne.
- Heke navbeynkar gotina we ji bo wergerê bibire, ji kerema xwe vê yekê bi xweşbînî pêşwazî bikin.

Pispore

- şîrîkê/a we yê/ya hevpeyvînê ye.
- divê piştrast be ku we her tişt fêhm kiriye.
- pirsên we dibersivîne.

Her dem rasterast bi pispore re bipeyivin û di dema axaftinê de lê binêrin.

Mala Navbeynkariya Ziman ji we re hevpeyvîneke serkeftî dixwaze!



Derbarê navbeynkariya ziman de pirs an fikarên we hene?

Ji vê navnîşanê ji me re binivîsin: info@haus-der-sprachmittlung.de

û bibin aboneyê/a [bultenê](#)!



Im Auftrag von:

